

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



"ZAROK FÉKIYÉ MALANE"



HÊJE MÊJE, EMÊ NUHA ÇEND

ÇIROK Û MESELÊN XWE

Jİ WERE BÊJIN

KULÎLK




Mirışkê ji xwe re got:

-A baş ew e,ku ez bi xwe vê heba genim
biçînim û wisa jî kir.

Genim şîn bû û serî da. Wexta çinîn û hilanîna wê hat. Dîsa mirîşk çû cem Werdekê û jê pirsî:


-Tu dixwazî alîkarîya min bikî, ji bo çinîn û hilanîna genimê min ?



Werdekê got:

-Na, ez naxwazim.

Mirîşk çû cem Qazê û ji wê jî pirsî. Lê qazê jî alîkarîya mirîşkê nekir.




Mirîşk çû cem Pisîkê û jê pirsî :

-Tu dixwazî alîkarîya min biki, ji bo ez
genimê xwe biçinim û hilînim ?

Pisîkê got:

-Na, ez nikarim.



Mirîşkê berê xwe da cem Beraz û jê pirsî:


-Tu dixwazî alîkarîya min bike, ji bo ez
genimê xwe biçinim û hilînim ?

Beraz got:

-Na,ez naxwazim.

Mirîşkê bawerî anî,ku wana alîkarîya wê
nakin. Wê ji xwe re got:

-A baş ez genimê xwe biçinim û hilînim.



Mirîşkê genimê xwe çinî,gêre kir,genim û ka ji hev du veqetand û hew ma hêrandina wî. Mirîşk dîsa çû cem wan "hevalên" xwe û ji wan alîkarî xwast,ji bo genimê xwe bibe êş:

-Werdekê got: Ne ez

-Qazê got: Ne ez

-Pisîkê got: Ne ez

-Beraz got: Ne ez

Hevîya mirîşkê dîsa ji wan nema û ji xwe re got:

-A baş,ez genimê xwe bibim êş û bihêrim.

Mirîşkê genimê xwe bir êş,hêrand û arvanê xwe anî malê.Mirîşkê vê carê ji bo hevîr alîkarî xwast:

-Werdekê got na

-Qazê got na

-Pisîkê got na

-Beraz got na.

Mirîşkê got:

-Baş e,ez ê bi xwe hevîr bikim û wisa kir.

Gava hevîr tîrş bû,mirîşkê alîkarî ji bo wî hevîrî li tenûrê xîne alîkarî ji "hevalên" xwe xwast.Lê dîsa kesekî ji wan alîkarîya wê nekir.Mirîşkê bi xwe hevîrê xwe li tenûrê xist.Hevîr pijî ya û bû nan.Mirîşkê sifra xwe hazir kir û ji wan pirsî:

-Kî dixwaze bi min re bixwe ?

-Werdekê got,"ez dixwazim"

-Qazê got,"ez dixwazim"

-Pisîkê got,"ez dixwazim"
-Beraz got,"ez dixwazim"
Mirişkê bersîva wan da û got:
-Na xêr! Ez ê vî nanî bi tenê bixwim.
Mirişk bi kîf dest bi xwarina nanê xwe
kir....



NOT: Ev çîrok ji alî şagirtekî ll salî û
navê wî WELAT e,ji swêdî hatîye wergerandin.

NAVÉ VAN HEYWANAN LÍ BINÉ WAN BINIVÍSÍN



.....



.....



.....



.....



.....

.....

PEYVEN PEŞİYAN

31 "Inkar kela mîran e!"

32 "Jin kele ye, mîr fele ye!"

33 "Berxê nîr ji kîrê râ ye!"

34 "Av ku da ser serî, ci bostek kêm,
ci zêde!"

35 "Mîrê çê simbêl, di dev da"ye.

36 "Ewil dibêjin şêrejin, paşê dibê-
jin şêremêr!"

37 "Derba mîran yek e!"

38 "Rê bî bila dûr bi, bûr bî bila
kûr bî!"

39 "Bêhna Şahbaz kete kepû!"

40 "Ker ku dê tesewir ke sira ku
di dûrbînê da!"

DI NAV NEH RESMAN DE DUDU WEKHEVIN.
MA HUN DIKARIN WAN BIBININ?



QUNCIKA DİROKA EDEBYETA KURDİ
AHMEDÊ XANÎ (2)

cografîyê ji çêkirîye û têda qala ezman û
stêrkan kirîye...."

Ahmedê Xanî her wekî wî bi xwe ji gotîye
"Mem û Zîn" ji xwe ra kirîye behane û wê hêncetê kula dilê xwe bi der daye, derdê miletê
xwe ê kerr û lal bi ziman kirîye û ew axivan-
diye.....:

*Sazi dil kul-bi zir û hem bit,
Sazendeye eşqî Zîn û Mem bit,
Şerha xemî dil bikim fesane,
Zînê û Memê bikim behane.
Nexme we ji perdê derînim,
Zînê û Memê ji nûva vejinim,
Derman bikim ez ewan dewa kim,
Wan du mededan ji nûva rakim,
Meşhur bikim bi terz û uslub,
Mumtaz bikim mihib û mehbûb,
Ew reng bikim ji nû serferaz .
Da bêne temâseyê nezerbaz,
Dilber li Memê bikim girinê,
Aşiq bikenin bi derdê Zînê.
Ev meyve eger xerabe, ger qenc
Kêşaye di gel wî me.dused renc,
Ev meyve eger ne avdare,
Kurmanciye, ew geder li kare.
Ev tifle eger ne nazenine,
Nubare, bi min gewî şérine,
Ev meyve eger ne pir lezize,
Ev tifle bi min gewî ezîze,
Mehbub û libas û guşvare,
Milkê di minin ne mişteare,*

Celadet Bedirxan derheqa A.Xanî de wusa dini-vîse:

"Pexemberê diyaneta me a milî, pexemberê ola me a nijandin". Xanî di wextê wele-da rabû koberiya niha bi sê sed û neh salan-ne li cem me, lê li Ewropayê ji xelk hej ji miliyet û li nijadê xwe his-yar ne bûbûn û zelamên ji yek miletî hev û du bo katolîkî an protestanîyê dikuştin. Di heymake weleda Ahmedê Xanî bîra miletîya xwe. bîra kurdaniya xwe birî bû û ji kurdan-ra gotibû hûn berî her tiştî kurdin, rabin ser xwe dewle-teke kurdî çêkin û bindestîya miletên din mekin".

Perçên jêrîn bona xwendinê ji "Mem û Zîn hatine jêder kirin :

*Ez pilewerim, ne gewherime,
Xudresteme, ez ne perwerime,
Kurmancim û kuhi û kenari,
Van çend xebatêd kurdeweri,
Emza biken ew bi hesen etlaf,
Eswa biken ew bi ismê ensaf. (355)*

*Ev name helal û ne herame,
Bê perdeye, lê ne bê migame,
Kurdî, erebi, deri û tazi,
Terkîb kirin bê hezil û bezi,
Hindik ji efsaneyêd Bohtan,
Hindik di bihane hin di bi ten,
Bohti, Mehmûdi û Silivî,
Hin lel û hinek ji zêr û zivi,
Xirmehre û morik û mirari,
Hindik d şitaf û tarî,
Tersih kirin weku biçûkan,
Înane bi gesir û sûkan,
Hin qise û hin ji wan misalin,
Hindik d helal û hin heramin (186)*

*Da bêne sere hikayata pêş,
Xelgê ku ji derd eşqê dil rês
Herçend ku bê hedd qiyas bûn,
A'mê xudan û hewas bûn,
Lakin ji xwadamêd mumtaz,
Sed law sehe qedd û serefraz,
Heryek d miqam husin rojek,
Heryek bi kelam sine sozek,
Her yek bi kemal bi der mahek,
Her yek bi cemal sedir şahêk,*


Ev je nemî aşqanî u çatîn,
Ev ji hemî talibin d raxib,
Bel-cumle di xidmeta emîr bûn,
Fil-cumle ji sîrrê hev xebîr bûn,
Serhelqeye wan peri misalin
Sertacê ewan melek xusalin.
Tajdin digotinê ciwanek,
Guderz ziman pehlewanek,
Nesil û nesib û husb e'yan bû,
Serdefter û serwerê kurdan bû,
Babê wî digotinê Skender,
Lakin ereban digot Xezenfer,
Lewra bi şêr şibê şêr bû,
Roja şerrê ew hezar mîr bû,
Tajdin du bira hebûn d qellaş,
Manendî du şahbaz cemmas,
Daym dil dijminan disotin
Yek A'rif û yek Çeko digotin,
Emma wî ji cimle xas a'man,
Ji ew çend bira û maman,
Lawik kiribû bîra ji bo xwe,
Ney ez xultem cîra ji bo xwe,
Roja ku ewî bîra nedîta,
Teşbih şeva çîra nedîta,
Dinya li wî têk dibû tarî,
Roj bû ku li wî dikir qewarî,
Mem ji li wî aşigek temam bû,
Ne şibhê bîra û bab mam bû,
Enbaz ferîh şîrik xem bû,
Ser geşteye xem bi navê Mem bû,
Herçend birayê axret bû,
Te digo d dinê û axret bû,
Tajdin weledê debîr diwan,
Mem ji xelte debîr diwan,
Ew herdu ciwan li yek du aşiq,
Ew her du bîra û pêkva sadîq,
Yek qyasê zemane, û yek Leyla,
Yek Wamiqe Eser û yek Ezra,
Ew yar ji dil ne ser seri bûn,
Bêh şibhetê mehir û müşterî bûn,
Yar û birayı muwaxat,
Nabit birayê megalet,
Yarı ne hêsaye, cefaye,
Meqsûd ji yarı wefaye
Axir te eger nekir wefayîş,
Ji eveel mede ber xwe cafayê. (49-51)

RÊYA RAST BİBİNİN!



QUNCIKA BAJAREN KURDISTANE
QEREKOSE (AGIRI) (2)

1930-da serhildanek mezin çêbû li derdora vê mintiqê û bi taybetî li derdora çayê Agrî.Kolonyalistên tîrkan bêçare man ji bo vê serhildanê bişkînin.Bo vê yeke gelek erd pêşkêşî Kolonyalistên İranîyan kir û bi wî awayî çayê Agrî xistin bin çemberê .Tê-kiliyê qahremanên kurdan li çar havêr hat birîn,piştî berxwedanek bi qehremanî sed mixabin ev serhildana jî hat şikenandin.




Gelek bawerdikin,ku gemîya NUH li ser çiyayê ARARAT e.

CİH : Merov dikare bêje Qerekose bi tevayî dikeve bakûrê Kurdîstanê, ûro nêzî sînorê ku Tirkî, û Sovyet dighêjin hev e. Li başûrê Qerekose wan û Bitlîs, li rojava-yê wê Erzerom û li bakûr wê jî Qers heye.

Heyşt(8) qezayên bajêr û 538 gundê wê henin. Qerekose li ser rêya Erzerom û Tebrizê ye.

Bilindîya bajêr ji avê 1640 metro ye. Hejmara rûniştevanê bajêr 30.663 kesin.

Qezayên Qerekose evin: D.Beyazit, Patnos, Eleşkirt, Diyadin, Hamûr, Taşlıçay û Tutak e.




ERDNIGARİYA QEREKOSE: Ev derdora, herêmeke herî bilind û herî bi çiya ye. Çiyayê herî bilind Çiyayê Agirî ye. Bilindbûna Agirîyê mezin 5165 m. Çiyayê bi dû Agirî yên herî bilind, çiyayê Sîpan e. Bilindbûna Sîpê 4434 metroye. Agirîyê Biçûk 3925 metroye, Çiyayê Tahîr 2475 m û çiyayê Kose 3442 metroye.

Hersal bi hezaran merov diçin li wan çiyanan digere û temaşa wan dikin. Çiyayên Agirî û Sîpan çiyayên vemirîne, berê ew volqan bûn. Herdû çiya jî çiyayên gelek bi heybetin û tu caran berf ji serê wan kêm nabe... Di nav gelê me de bi sedan sitran û helbest li ser herdû çiyan tê gotin.

Çemê herî girîng Murad e. Murad pîyek ji Ferêt e. Gelek avên biçûk henin. Hemû jî di kevin nav ava Muradê. Golek pir biçûk heye, navê wê "gola Masîya" ye. Qerekose ji alî daristanade ne dewlemende.

HEWA : Herêmek gelek sar û têr berf e. Hâvîn gelek germ e û tiştek nabare. Zivis-tana wêgelek sar e, pir berf dibare û zi-vistana wê dirêj e. Di biharan da jî berf dibare û qesa dikeve. Baran bi piranî di meha Nîsanê û gulanê de dibare.

DI NAV WAN HER DU RESMAN DE BENC TIŞT NE-
WEKHEVİN, HUN DİKARİN WAN BİBİNİN ?



QUNCİKA MUZİK È
NOTENİVİS CEMİLA CELİL

NÎNIK NÎNAÊ TEME 35.

Allegro

Nî - nik Nî - na - ê te - me,
Ç'e'v - rëş mî - va - nê te - me.
ha, ha, ha, Nî - no, Nî - no.
ha, ha, ha, Nî - no.


Nînik Nînaê teme, ha, ha, ha, Nîno.
Ç'e'vřeş měvanê teme, ha, ha, ha, Nîno.
Nîno, Nîno, Nîno, Nîno.

Sibê ser rëka xweme, ha, ha, ha, Nîno,
Dusibê cînarê teme, ha, ha, ha, Nîno,
Nîno, Nîno, Nîno, Nîno.

Aşıqê bejna teme, ha, ha, ha, Nîno.
Deqa ser sîngê teme, ha, ha, ha, Nîno.
Nîno, Nîno, Nîno, Nîno.

Bazinê destê teme, ha, ha, ha, Nîno.
Gustîlka t'ilya teme, ha, ha, ha, Nîno,
Nîno, Nîno, Nîno, Nîno.

NAVEN WAN TIŞTANAN Lİ BİNE WAN BİNİVİSİN



P E Z A N İ N

Pirs: 1

Hûr hûr barî,
Hey-hey barî,
Deşt û banî,
Her çar alî,
Girt û danî.
Ew çîye ?

Bersîv:.....

Pirs: 2

Wêda tê wezîr e,
Rûdinê qisîl e,
Radibe hêşîr e,
Ew çîye ?

Bersîv:.....

Pirs: 3

Xare ne dare,
Dimike ne kar e,
Dikşe, ne mar e,
Ew çîye ?

Bersîv:.....

M I J Ü L İ

Di vi resmi de, 5 çük hatiye vesartin.
Ma hun dikarin wan bibinin ?



ÇEND PARÇE JI ŞOVÊD "ZEMBILFIROS"

Jİ BEREVOKA A. SOSIN

*Ey dil werin disan bicoş,
Carek ji caran mey binüş,
Bikin qiseta Zembilfiroş,
Da seh bikin hikayetê.*

*Zelbilfiroş lawkê rewal bû,
Bi kîlfet û ehl û eyal bû,
Husneki Usif li bal bû,
Heq rizaqê qismetê.*

*Qewin ew lawê feqir bû,
Dayme xwedê debir bû,
Pêşê xweda jêr bû,
Ew bi dest hebû sene'ete.*

*Şixulê wî selik û tebeq bû,
Qîmeta selkan wereq bû,
Dayma ew rast heq bû,
Pê debiri kîlfetê.*

*Ew bi dest zembîl bi dest,
Dibirê bazarê bi qesd,
Xwarin nan dihat bi dest,
Razî dibû qismetê.*

*Her dema selkan ku tîne,
Katûnek jorda dibîne,
Bi dil û can dihebîne,
Dil kete pêla muhbîtê.*

*Muhbîtê keç mübtela kir,
Sur li cariya aşkera kir,
Lawukî qelbim cuda kir,
Min ji eşqa xew ne tê.*

*Law rast bû bi xwedêra,
Pir ji wê qenca dikêra,
Go min ji te navê tu zêra,
Tu min xilaskî ji zehmetê.*

*Katûn dibê ev xeber tunîne,
Şerm meke, were nav nivîne,
Min bi te day evîne,
Da em bibînin heşmetê.*

*Taw dibê tîrsim ji xebere,
Dev hereme, têne riyare,
Agirek bi wanda dibare,
Narı cama şerbetê".*

*Xatûn dibê tu lawê beyani,
Lew dibem da tu bizani,
Min tu ji bo dilê xwe anî,
Da em bikin misilhetê.*

*Law bi xatûnêra debetê,
Tu mixaziya dil devete,
Daym ji heq nekin vehetê,
Rû spiyin d axretê.*

*Xatûn dibêje bavêje xeyalan,
Were ser doşek û palan,
Bihن ke zulf û xalan,
Law dibe zilfê herîre.*


*Pîroz be lawê mire,
Çi hede lawê feqire,
Tev bide vê misilhetê,
Xatûn dibê lawê verêvan.*

*Were nav reyhan û sêvan,
Tu şekir bimêj bi her du lêvan,
Şibhe cama şerbetê,
Law bidê tu qenca temamî.*


*Her weki şekir di camê,
Bi ser û p'eyan tu li min heramî,
Tîrsim ji roja axretê.*

Jİ DESTNIVİSARA MIN FOLKLOR

*Zembilfiroş selikan dibe-tîne,
Mal bi mal digerine,
Bejn û bala vî nûrine,
Jin û búkan ji imanê der tîne,*






WAN HEJMARAN YEKO-YEKO BIGIHININ HEV





	11	5	4
1		10	
	13		
7		16	9

XACEPIRS



P E Z A N İ N

Pirs: 1

Him şil dike,

Him dîwar qul dike.

Ew çîye ?

Bersîv:.....^{Dilop}

Pirs: 2

Oda şuştî-muştî,

Cotê qazan têda rûniştî.

Ew çîye ?

Bersîv:.....^{Çav}

Pirs: 3

Du xûşkê cînar,

Ji hevdu nakin bawer.

Ew çîye ?

Bersîv:.....^{Çav}

Pirs: 4

Tîşkî min heye tiştanok,

Dinîya hemû têdaye.

Ew çîye ?

Bersîv:.....^{Guh}

XAÇEPIRS



2


3

G	O	R	E
---	---	---	---


1↓

3→

T	R	Ê	N
---	---	---	---



6



1

6

5→

X				D
I				Ş
Q	A	R	I	K


7↓

4↓


H	Ê	L	K	A	N
---	---	---	---	---	---



5



4



30



7


KEREKÎ ME HEBÛ Û KUNDURKÎ ME

KERÊ ME KUNDURÊ ME KOT KOT KOT,

ME JÎ ÇIROK Û MESELÊN XWE

YÊN VÊ HIJMARÊ JI WERÊ GOT

KULILK



www.arsivakurd.org



YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !



UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA CANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNİŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr
BIHA